

Polîtîkayên rûxandinê Bi vîna azad a gelan têk çûye

Desthilatdarî paşeroja xwe bi gor kirina nijatperestî, dîncîti, cînsiyetparêzî û neteweperestiyê dixin bin temînatê. Ji ber ku desthilat nêr e. Di vê yekê de jî ya ku wek wî nanêre, yan jê dixwaze bibe koleyê wî, yan jî tune dike û wisa hewl dida desthilatdariya xwe bidomîne. Ji ber vê çendê, ji ber mayînde kirina desthilatiya xwe, her çûre bê hiqûqî, bêrêtiyê, neheqiyê, bi bikaranîna şeweyê zor, zext, tundî, qirkirin û tunekirinê, ji bo îtibara xwe mubah dibîne.

Zîhniyeta tekparêz çetil dike

Ji destpêka avabûna komara Tirkîyê û vir de zîhniyeta îttîhat teraqî di her pêvajoyê de bi destê dewlet û hikûmetan wek şiv li ser serê Kurdan hatiye hejandin. Polîtîkayên ku di encama zîhniyeta îttîhat teraqî de hatî avakirin û ev bi sed salane hîn didome, di bin navê avakirina zîhniyeta tekparêz de, di her pêvajoyekê de komkujî, nijadkujî, tune hesabandin, zext, tundî û asimilasyon xistiye meriyetê. Pirsgirêka Kurd ku bi van polîtîkayan hat kûr kirin, ji nedîtî hatin, pirsgirêk daxistin pirsgirêkeke ewlehiyê û bi vî rengî çareseriyê wê nepêkan hat nîşandayîn.



Salîha
AYDENİZ*

Dewleta komara Tirkîyê, wek polîtîkayek dewletê ji aliyekê tune dihesibîne, bi polîtîkayên çewisandin û asimilasyonê gelê Kurd ji nedîtî tî, ji aliyê din de gelê Kurd, ji ber hebûna xwe a wek gelekê carekedin dikevin zanebûna ku mafê wan yê statû, ziman, çand û siyasî heye û serhildanekê didin destpêkirin. Ev serhildan, serhildana herê bi heq û rewşa a gelekê bû ku dihat çewisandin, tune hesabandin û rastê asimilasyonê dihat. Ev serhildana ku ji roja ku destpêkirî heya roja me ya îro tê xwestin bi polîtîkayên şer ên herê giran bê tepisandin, lê her roja ku diçe, polîtîkayên şaş ên hatin sepanandin ev pirsgirêk hîn zêdetir kûr kir û veguheriyê kaosê ku îro bi rastiyeke wiha re rû bi rû hatiye hiştin. Polîtîkaya îttîhat teraqî a sed salan ya çewisandin, tune hesabandin û asimilasyonê negirt, gelê Kurd her roja ku diçe zêdetir bi hêz dibe, statû, ziman, çand û biryardariya xwe a baweriyê nîşan daye û daxwaza xwe a heq û rewşa mezîniyê kiriyê.

Ev polîtîkayên dewletê ên giştî dihatin meşandin û ji sala 2002'an vir de jî AKP ku li ser desthilatdariyê bû, bi heman biryardariyê polîtîkayên şer û plana rûxandinê domandiye. Ji roja ku hikûmeta AKP'ê bû desthilatdar, bîrdoziya xwe a remsî xistiye devrê û xwestiyê civakê îslamî, sunî avabike. Bi civak û ferdê dîncî, neteweperest, zayendperest, dixwest zîhniyetek nêr a lêpîrsîn nake û tenê a dibêjnê pêk tîne, ava bike.

Bê çareserî hiştina pirsgirêka Kurd

Hikûmeta AKP'ê, li ser polîtîkayên tune hesabandinê ên sedsalekê rêbazên nû zêde kiriyê û wisa domandiye. A rast desthilatiya AKP'ê li Tirkîya salên 90'î de, ji ber tengasiyên di siyaseta hundir û derve da ku dihat jîn, wek encam derketiyê holê û pêşketiyê. Di rastiyeke de ev pêşketin ji aliyê hêzên hegemon ên ku di mijara ka wê Pirojeya Mezin a Rojhelata Navîn (BOP) kê bi encam bike, biryara wê hat dayîn û bi destê van hêzan rol dan AKP û Erdogan û ew anîn ser desthilatdariyê. Hewceye ev piştewanî wek senteza Tirk-Îslam a li Rojhelata Navîn ku hewldaneke nû a dizayn kirinê ye, bê fêm kirin. Dîsan bi vî alika-



Ji destpêka avabûna komara Tirkîyê û vir de zîhniyeta îttîhat teraqî di her pêvajoyê de bi destê dewlet û hikûmetan wek şiv li ser serê Kurdan hatiye hejandin. Polîtîkayên ku di encama zîhniyeta îttîhat teraqî de hatî avakirin û ev bi sed salane hîn didome, di bin navê avakirina zîhniyeta tekparêz de, di her pêvajoyekê de komkujî, nijadkujî, tune hesabandin, zext, tundî û asimilasyon xistiye meriyetê. Pirsgirêka Kurd ku bi van polîtîkayan hat kûr kirin, ji nedîtî hatin, pirsgirêk daxistin pirsgirêkeke ewlehiyê û bi vî rengî çareseriyê wê nepêkan hat nîşandayîn.

riyê re AKP ku li ser desthilatiyê bû, di pêvajoya xwe a ewil de hîn zêdetir nêzikatiyek lîberal raber kir û bi vî nêzikatiya xwe jî alikariya hin kes û verdoran girt.

Bi van hemû pêşketinan re bê çareserî hiştina pirsgirêka Kurd di serî de li Tirkîyê, li Rojhelata Navîn bûye sedema tîdemayîn û mezîniyê bûna pirsgirêkan. Tam jî di demeke wiha de birêz Ebdullah Ocalan manifestoya çareseriyê di Newroza 2013'an de weşand û ev yek jî aliyê her kesekê de bi erênî hat nixandîn. Ev manifestoya di serî de ji bo gelê Kurd, hemû gelên li Tirkîyê dijîn, her wiha hemû kesên xwedî baweriyên cûda hêviyek da avakirin. Bendewariya ku bi ked û hewldaneke mezîniyê ji bo ku pirsgirêka Kurd bi rê û rêbazên demokratîk bê çareser kirin û ev çareserî jî ku bi rêya birêz Ebdullah Ocalan, bi pêvajoya diyalog û dovre jî veguhere niqaşan, bi vî encam bibe, ji hêla hemû civakê ve bi erênî hatiye pêşwazî kirin.

Tifaqa faşîst a li dijî Kurd

Em dikarin bibêjin ku diyaloga di navrera sala

2013-2015'an de didoma, ji aliyekê de veguherîna wê a bi pêvajoya aştiya civakî, ji aliyê din de jî hikûmeta AKP'ê, bîngê zîhniyeta tekparêz a Erdogan di nav bendewariya vî yekê de bû ku ev pêvajoyê li gor berjewendiyên wî pêk bê. Ji ber ku ji aliyekê diyaloga di navbera aliyên didoma, ji aliyê din de ku komkujîya Parisê dihat plan kirin û plana rûxandinê ku di civîna MGK'ê a sala 2014'an de hat girtin, beriya 7 Hezîranê jî bi sedan avahiyan HDP'ê rastê êrîşan hat û bilind bûna pêla nijatperestiyê a li parêzgehên rojava û gelek hewldanên lînc kirinê ku bilind dibû; a rast bendewariya aştiya civakî ku diqulipî ser neteweperestî, cînsiyetperestî, dîncîti û nijatperestiyê ji xwe hewldanek bîrdoziya resmî bû û ji aliyê wan de ev yek dihat gur kirin.

Di dawî de encama hilbijartinên 7 Hezîranê bû sedem ku tevahiya pêvajoya erênî a diyalogê ku di civakê de atmosferêk cûda dabû avakirin, li Tirkîyê ne tekparêzî, piranîparêzî, bi hev re jîyan kirina cûdahiyên û vîna birêvebirênê derxîne holê. Tam jî di demeke wiha de zîhniyeta tekparêz a sedsalan tifaqa faşîst dixwe devrê, rûyê xwe yê rast nîşan dide û bi dengê bilind israra xwe a di şer de aniye ziman. Dema ku dît tevahiya pêvajoya diyalogan a dihat jîn nekarî ji bo zîhniyeta xwe a tekparêz, dîncî, neteweperest û cînsiyetperest bixwe tevgerê, ji bo bisazibûna faşîzmê, vîna ku derketibû holê nenasî, ket nav hewldana ku hêza desthilatdariya di dest xwe de li gor berjewendiyên xwe bikar bîne.

Tunekirin û qirkirinek topyekûn

Li Tirkîyê dîsan bi gotinên dijminane, nijadperestî dixin devrê, li bakurê Kurdistanê ku zext, zordarî û qetlîam dihat meşandin, li hemberî tîkoşîna şoreşa mezîniyê a gelan ku li Rojava bilind dibû jî êrîşek mijara gotinê bû, hêzên tîkoşerên Rojava 'Terorîst' îlan kirin û ev yek jî dijminahiya li hemberî Kurd û Kurdistanê û rewşa polîtîkaya topyekûn a tunekirinê ku xistine devrê dide nîşandayîn. Piştî vî qonaxê şûnde, çewisandina sadsalan, tune hesabandin û polîtîkayên asimilasyonê bi tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê re û bi polîtîkayên îmha û komkujiyê re şer hatiye gur kirin. Pêvajoya ku ev 3-5 salên dawî de didoma, di hundir, derve da, li kolan û mal de, yanî li her devereke dijminahiya li hemberî Kurd yan jî li hemberê her ke-

Kûr kirina tecrîtê wek berdewamiya komploya navnetewî fêm kirin girîng e. Ji ber ku bédengiya cihanê a li hemberî êrîş û dagirkeriya li dijî Efrîn û Şengalê, dîsan rexmê komkujîya sivîlan tu bertek nîşan nedayîn rastiya komployê radixe ber çav an. Li Rojhelata Navîn di serî de gelê Kurd, gelan biryara xwe a xwe bi xwe, xwe birêvebirênê daye û li hemberî vî rastiyeke jî faşîzma AKP-MHP'ê li dijî destkeftiyên Kurdan şer daye destpêkirin.

sekê/î ku li gel Kurd sekinî be rewşa bi şer xistiye devrê. Ji ber ku gelê Kurd wek gel hebûna wî her tim rastê zext, çewisandin, tune hesabandin, asimilasyon, rûxandin û komkujîyan hatiye, lê rexmê vî jî dest ji ziman, statû, çand û sekna xwe bi xwe, xwe birêvebirin û biryardariya xwe ber nedaye, di encama vî yekê de zîhniyeta tekparêz neçarê binketinê bûye û bersiva vî yekê jî bi berxwedanê hatiye dayîn.

Ji ber gotinên dijminane ên Erdogan û kadroyên AKP'ê; di sala 2011'an de li Îzmîrê Gazî Akbayır, di 2014'an de li Antalya-Kaşayê Mahîr Çetîn, di sala 2015'an de li Stenbol Kagithaneyê Sedat Akbaş û herê dawî jî di sala 2018'an de li Sakarya Hendekê Kadîr Sakçı tenê ji ber ku gotibû ew Kurd e, hatibû qetilkirin.

Rewşa OHALê, zext û qirkirin

Tam jî di rasta van pêşveçûnan de, ji 5 Nisana 2015'an û vir de li ser birêz Ebdullah Ocalan tecrîteke giran hatiye destpêkirin. Bi tecrîta ku ev 5 sal in didome re konsepta şer, îmhaya topyekûn û li bakur, başûr û rojava êrîşek berfireh xistine devrê. Mekanîzmaya darbeyê ku di encama bê çareserî mayîna desthilatdarî û jî ber bê polîtîka mayîna wî dikeve devrê, her çend di encama sekna dijber a tevahiya dînamîkên civakî hat dewisandin, lê tifaqa faşîs ev yek wek kerema xwedê nixand û OHALê îlan kir, ev yek veguherandin amûrek zextê. Piştî vî qonaxê şûnde, bi KHK yê ku derxistin şaredarî hatin destseker kirin, bi dehan sazî, rojname, tv û sazîyên jin hatin girtin. Bi sed hezaran kedkarên di karên giştî de ji kar hatin derxistin. Piştî rewşa OHALê a du sal an, bi biryarnamaya Serokkomar re her tiştê di girêdayî tek zîlamî dibe û bi vî re hewl tê dayîn li Tirkîyê rewşa OHALê û li Kurdistanê jî pergala rewşa awarte bê mayînde kirin. Vaye li Tirkîyê pergala tek zîlamî a tê xwestin pêk bînin; di rastiyeke de konsepta şer, polîtîkayek topyekûn a îmha kirinê ye ku xistine devrê û tecrît giran kirine.

A rast kûr kirina tecrîtê wek berdewamiya komploya navnetewî fêm kirin girîng e. Ji ber ku bédengiya cihanê a li hemberî êrîş û dagirkeriya li dijî Efrîn, Kerkûk û Şengalê, dîsan rexmê komkujîya sivîlan tu bertek nîşan nedayîn rastiya komployê radixe ber çav an. Li Rojhelata Navîn di serî de gelê Kurd, gelên li Rojhelata Navîn biryardariya xwe a xwe bi xwe, xwe birêvebirênê daye û li hemberî vî rastiyeke jî desthilatdariya AKP-MHP'ê li dijî tevahiya destkeftiyên Kurdan şer daye destpêkirin. Ev şer bi hemû gemariya xwe didome. Ji aliyekê gotinên Erdogan û herkesê ku wek wî nafikire, rexmê dike, bertek raber dike 'terorîst' nîşan dide û dike hedef, bi van gotinan jî nijadperestî tê belavkirin. Dîsan êrîşê goran tê kirin, tevlibûna ji merasîman tê asteng kirin, ev êrîş û asteng kirin jî bi taybetî ji aliyê çapemeniya girêdayî desthilatdariyê tê servis kirin, bi vî yekê re jî tê xwestin civakê neteweperest, dîncî û zayendperest bê avakirin.

Zîhniyeta tekparêz a ku li ser Kurdan û Rojhelata Navîn ku cihê tevahiya şaristaniyan, cihê jî dayîkbûna mirovahî û jîyanê ye, tê ferz kirin, neçarê wînda kirinê ye. Ji ber ku şeweyê çareseriyê xitimandina netew-dewletê, modela netewa demokratîk e ku dikare carekedin can pê bide û ev rastiyeke nabe dest jê bê berdan.

*Parlamentera HDP ya Amedê

